Duderi e.V.

EuroMed Feminist Initiative
المبادرة النسوية الأورومتوسطية
Initiative Féministe EuroMed

# KURTASIYEKE PÊKANÎNÊ

# Pêwîstiyên jinûveavakirina sektora perwerdeyê di qonaxa veguhestina siyasî de

KAXEZEKE SIYASETAN

## الباحث:

**د. صفوان قسام**

اختصاصي وباحث في علم الاجتماع وعلم النفس الاجتماعي

## فريق دودري:

**صبيحة خليل**

خبيرة الجندر، المديرة التنفيذية

**أليس مفرج**

مديرة البرامج

# KURTASIYEKE PÊKANÎNÊ

## Pêwîstiyên jinûveavakirina sektora perwerdeyê di qonaxa veguhestina siyasî de
## KAXEZEKE SIYASETAN

Ev kaxez girêdayî lêkolîna yekem e ku rêxistina "Duderî" bi navê "Dînamîkên dûrxistin û zorê di sektora perwerdeyê de û bandora wê li avakirina aştiyê di Sûriyê de", ya bi hevkariya Însiyatîfa Euro-Medîterrane di îlona 2023'an de kar li ser hat kirin.
Di vê kaxezê de, me xwe spart gelek encamên bingehîn ên ku ji lêkolîna hatiye bibîrxistin derket, ku Idlib, Reqa û Siwêda di nava xwe de girt. Ji van derencaman me dest pê kir, ji bo firehkirina nimûneya ku ji civaka sûrî hatiye lêkolînkirin bi rêya zêdekirina sê herêmên nû ew jî Dera', Efrîn û Qamişlo; ku lêkolîna derbarê van hersê herêmên nû ê bihêle ku em ji aliyekî ve bi awayekî zêde rastiya encamên berê biçesipînin, û bigihêjin pêşniyarine sergihayî, giştî û tekûztir ji aliyekî din ve, bi taybet mijarên girêdayî dadweriya veguhêz, vejandina zû, jinûveavakirin û geşbûna domdar.
Civateke guftogoyî tekûz li her herêmekê ji van herêman di heyama herdu mehên nîsan û gulana 2024'an de hat lidarxistin. Her civatek 10 beşdarvanên ku di sektora perwerdeyê de kar dikirin an pêşengên civakî ku baldariyê didin perwerdeyê tevlê bûn. Hejmara beşdarvanan nîv jin û nîv mêr bûn gihîşt 60 beşdarvan.

Kaxez li ser çar tewereyan bû:

**1-Materyal û minhacên perwerdeyê, û vejandina derûnî-civakî. Ev xal girtin dest:**

- Bersivdayîna minhacan û prosesa perwerdeya sûrî ya niha ji bingehên avakirina dewleta demokratîk, pirrengî hemdem re.
- Serxwebûn û bêalîtiya minhacan.
- Pêşxistina minhacan.
- Tenduristiya hişî û piştgiriya derûnî civakî.
- Sûdwergirtina ji şareza û tecrubeyên gelên ku di rewşên şer re derbas bûne û bi rêya perwerdeyê hişyar bûne.

**2- Samana civakî, hevrêzî, piştgirî û avaniya binesazî:**

- Hevrêziya di navbera rêxistin û çarçoveyên perwerdehiyê.
- Çareserkirina mijara dûrketina ji xwendinê.
- Rêbaz û alavên perwerdekirinê.
- Domdariya kuwalîteya perwerdeyê.
- Pêşxistina rola perwerdeyê di avakirina samana civakî de.

**3-Cihêrengiya civakî sûrî û beşdarkirina rêxistinên navnetewî di sektora perwerdeyê de:**

- Cihêrengiya zimanî û nijadî li Sûriyê.
- Rola rêxistinên navnetewî di mijara danasîna bi bawernameyan.
- Saziya perwerdeyê û veguhestina siyasî.
- Beşdarbûna avakirina Sûriyayê bi rêya vejandina zû, jinûveavakirin û geşkirina domdar.

# Metodolojî:

Nêzîkatiya metolojî di dahûrandina civatan de, li ser dabeşkirina her şeş herêman di sê koman de hat bikaranîn, ew jî: (Idlib – Efrîn), (Qamişlo – Reqa), (Siwêda – Dera'), li gorî hevpariya erdnîgarî û nêzîkbûna çandî û siyasî. Her wiha li gor şubheta di pêkhateya mirovî û hêzên desthilatdar di her komek ji koman de. Kar li gor rêgeza: Çi heye û çi divê bibe hat kirin?(1); ango destpêkirin ji têgihîştin û dahûrandina rasteqîna heyî, ber bi avakirina nêrînekê derbarê çi divê di pêşerojê de bibe.

Li ser bingeha nêzîkatiya hatiye destgirtin, alaveke dahûrandinê taybet bi tabloyan hat dîzaynkirin, û ji bo nivîsandina raporên civatan hat bikaranîn ta gihîşt derencam û pêşniyaran.

**Hemû civat bi van pêşniyaran derencam bûn:**

## a- Kurs û minhacên perwerdehiyê û vejandina derûnî-civakî:

Kaxez pêşniyar dike ku rêgezên girêdayî (hemwelatiya wekhev, pirrengî, cihêrengiya sûrî, wekheviya cenderî, derfetên wekhev di navbera zayendan de), bersivdayîna prosesa veguherîna demokratîk a civaka Sûriyê, ku her çespandineke kiryarên cudakirinê û zorê ku di çanda civakî de heye, betal dike, bi armanca bilindkirina civakê ji bo xurtkirina ewlehî, aştî û hêminiyê weke destpêkekê ji bo demokrasiyê; ango ev rêgez ne ji ecendayê desthilatdariya desthilatê derdikeve. Bi gotineke din, divê ev rêgez werin çesipandin ((bi wateya xwe ya avanî, ne weke idyolojî))(2); ji bo pêkanîna wê yekê, divê dest bi hokirina civakê bi awayekî pêlekî were kirin, ji bo ku ev rêgez bibin xwedî nirxekî bingehîn ku civak bi girîngiya wê bihese; ji ber ku di ((hin cihan de.. prosesa guherîna idyolojîk û ferzkirina îdyolojîk cihekî girîngtir di hemû sîstema perwerdeyê

(1) Li gorî rêgeza "Immanuel Kant" di têgihîştina wî ji zanîna teorî û zanîna pratîk re, weke ku di pirtûka xwe ya ''Rexnekirina aqilê sade'' de.
(2) Yek ji beşdarvanan di civata guftogoyî de li Reqayê, dest nîşan kir ku civak lîstikvanekî sereke ye, em nikarin nêrîna wî/wê di pêşkêşkirin an nepêşkêşkirina debistanê (û saziyên perwerdeyê bi giştî) van têgînan paş guh bikin. Heta ku bipejirîne, nabe ji aliyekî desthilatdar ve li ser were ferzkirin, lê belê li gor pêwîstiya wî/wê be, xwedî esûl di çanda wî de be, ne awarte be.

de jî digire))[3]. Her wiha divê dîmen û qalibên nimûneyî yên di prosesa perwerdeyê de hatine çesipandin werin guhertin, weke mînak: xwendina amadeyî ya pîşesazî ji bo xortan û xwendina hunera jinan[4] ji bo keçan, ji bo têkbirina fikrên çewt ên girêdayî jinetiyê, dibe ku hemû navlêkirin ji bingeh ve were guhertin eger pêwîst kir.

Her wiha pêwîste sîstema perwerdehiyê meylên xwedekaran ji refên destpêkê bişopîne, û xurt bike bê ku bi zorê kontrol bike, û wan ber bi beşên ji bo wan guncav in bibe. Divê dadwerî di mûçeyan de jî di navbera karan de were pêkanîn ji bo qedexekirina cudabûnê di dahatûyan de ku bandorê li meylên xwendekaran neke, taybetmendiyên her herêmekê were berçavgirtin gava ku bernameyên geşkirin, vejandin û jinûveavakirinê tên danîn. Divê binesaziya pêwîst were dabînkirn, û piştgiriya mamosteyan ji aliyê madî, civakî û derûnî ve were kirin.

**Pêşniyar daxwaza van jî dikin:**

1. Cudakirina siyasetê ji perwerdeyê, û danîna armancine perwerdehî ku nêzî hemû aliyan be bi heman dûrahiyê, ku hemû şebengên civaka Sûriyê di nava xwe de bihewîne. Lewre divê minhacên xwendinê di hemû herêman de bibin yek, û hemûyan temsîl bike. Divê minhac werin pêşxistin û komîteyeke pêşxistinê bêalî, rasteqînî, serbixwe, destpak, xwedî şarazayeke dirêj were avakirin û herdu zayendan û hemû pêkhateyên civaka Sûriyê temsîl bike; her wiha divê komîte aliyên derûnî, civakî û çandî yên xwendekaran bigire berçav, xwediyên şaraza û xwediyên xwedekaran beşdarî prosesa pêşxistinê bikin, nimûneyeke tecrube pêk bînin berî were belavkirin. Divê ev komîte tam serbixwe bin, nabe tu kes destwerdanê di karê wan de bike, divê armanca dewleta pirrengî, berjewendiyên wê û berjewendiyên gel berçav bigire. Pêwîstiyên bazara kar û rewşa aborî û cudahiyên hawîrdûrî berçav bigire.
2. Piştgirtina rênîşandêrên derûnî û civakî bi rêya amadekirina wan ji aliyê pîşeyî ve di zanîngehê de, û peydakirina perwerdeyên dewrî, dabînkirina alavên karên wan û xurtkirina cihên wan di dibistanan de. Dîsa divê tîmên rênîşanê di dibistanan de kar bikin. Divê di tîman de dermanker, bijîşk û bijîşkên derûnî jî di her koreyeke perwerdehiyê de hebin, û dermankirinê di navbera wan de were çalakirin. Her wiha divê karên kaxezî di dibistanan de kêm bibin û xwe bispêrin aliyê pratîkî.
3. Sûdwergirtin ji tecrubeyên dewletên dişebihin me, weke ezmûna dewleta Başûrê Efrîqiya ku waneyên derbarê lihevkirinê û jiyana aştiyane derbasî minhacên perwerdeyê kir, û kampaniyên hokirinê bi rêxistin kir ji bo xurtkirina nirxên efûkirin, dadwerî û hemwelatîbûnê, û ezmûna

(3) Civata Reqayê.
(4) Dibistanên amadehî yên hunerên jinan: ew dibistanên amadehî ne, pirî caran ji bo keçan hatine amadekirin. Tekûzî li ser çesipandina rolên nimûneyî yên girêdayî keçan ku wan li ser vê yekê perwerde dikin, weke dirûn, tetrîz, çêkirina xwarinê, tîmarkirina zarokan; bi şaştî bi hunerên jinan tê binavkirin – weke ku huner taybet e bi zayendekî! Ku dihêle têgeha jinatî ber bi têgeheke tam berûvajî wê ve biçe weke felsefeyeke civakî.

dewleta Rewandayê ya ku tekezî li ser jinûveavakirina tevna civakî kir bi rêya bernameyên perwerdehî û çandî ku armanc jê xurtkirina yekîtiya neteweyî û lihevkirinê ye(5). Ew herdu dewlet êşa şerên dirêj kişandin ta gihîştin asta jenosaydê.

## b- Hevrêzî, piştgirî û binesazî:

Kaxez pêşniyar dike ku encumanek ji bo perwerdeyê were avakirin, rola wî şêwermendî be ji bo danîna siyasetên perwerdeyê di qonaxa jinûveavakirinê de, û perpirsê hevrêziyê digel rêxistinên herêmî û navneteweyî be ji bo misogerkirina domdariyê û dabînkirina pêdiviyên perwerdeyê ji projeyên curbecur ku rastî tê ber bi sergihayeyî û domdariyê ve bibe. Divê dîsa hevkarî bi rêxistinên navneteweyî re were kirin ji bo pêşxistina minhacên demkî û bêalî di heyama qonaxa veguhestinê de, û pêkanîna nimûneyên perwerdeya lezkirinê û ya qerebokirinê ji bo çareserkirina diyardeya dûrketina ji dibistanê, dibe ku dewama beşî ji xwendekarên dûrketî re li dibistan an peymangehan were pêkanîn ku rojê du saetan ji bo perwerdeya xwendin, nivîsandin û bîrkariyê be.

Her wiha divê piştgiriya madî ji malbatên xwendekarên ji xwendinê dûrketine re were dayîn, bi merca ku zarok rêjeyek ji amadebûnê pêk bînin, alavên perwerdeyê werin dabînkirin ji bo sivikkirina barê xwediyên wan, û hokirina xwendekarên dûrketî ku vegerin dibistanan. Dîsa divê kadroyekî perwerdeyê amadekirî bin ji bo danûstandinê bi kesên ji xwedinê dûrketî re bike were peydakirin, û tekezî li ser girîngiya avakirin û amadekirina dibistanan bi giştî û li herêmên dûr bi taybet, ji nû ve dibistanên ziyandîtî werin amadekirin, ji ber ku hin kes **"tekezî li ser zêdekirina hejmara dibistanan nakin, lê tekezî li ser zêdekirina mizgeftan dikin"(6).**

**Kaxez van xalan pêşniyar dike:**

- Çareserkirina mijara zewaca zû.
- Çareserkirina karkirina zarokan û tiryakê.
- Kampaniyên hokirinê û serdana malan.
- Ji nû ve çalakkirina zagona mecbûriya perwerdeyê.
- Erkdarkirina mamosteyekî/e alîkar di fêrgehên mezin de.
- Perwerdekirina mamosteyan li ser şêwazên perwerdehiyê yên nû û cihêreng, weke perwerdeya înteraktîf û beşdar ku li ser hizrandina rexneyî tê avakirin.

(5) Mazin Neqaşe, Jinûveavakirina Nasnameya Neteweyî ya Sûrî di Qonaxa Piştî Şer de: dahûrandina rola çandê digel perwerdeyê, lihevkirin û ezmûnên navneteweî, nameya Master, Dibistana Bilind a Çapemeniyê û Pêgihandinê, Parîs, Hola Têkiliyên Navneteweyî, Parîs, 2024, r-r 58 – 59.
(6) Ji civata Efrînê ku beşdarvanan dest nîşan kirin ku şaştiyek di rêzkirina pêdiviyên civakê de heye.

- Pêkanîna bernameyên perwerdehiyê ku guncavî qonaxa jinûveavakirinê[7] bin bi hevkariya civaka xwecihî.
- Sazkirina komîteyeke rahênanê ji bo danûstandinê digel pisporan û nûjenkirina rahênan bi awayekî rêkûpêk.
- Başkirina mûçeyên mamosteyan û bilindkirina posta mamosteyan li ser bingeha şaraza, destkeftî û pêşketina pîşeyî, ne tenê li ser bingeha dirêjahiya heyama perwerdekirinê.
- Xistina materyala "Exlaq" di dibistanan de.
- Girêdana derencamên perwerdeyê bi bazara kar ve.
- Çalakkirina kerta xwedekar a dibistanê ji bo şopandina girîngiyên wî/wê û pêşkêşkirina alîkariyê di rêçûnên wî/wê de.

## c- Cihêrengiya civakî ya sûrî û beşdarkirina rêxistinên navneteweyî di sektora perwerdeyê de:

Kaxez pêşniyar dike ku minhac bi zimanê erebî be digel hin wane ji bo zimanên kêmneteweyên sûrî hebin, û peymangehên taybet ji bo perwerdeya bi zimanên cuda li ser hesabê dewletê be. Her wiha divê danasîn bi cihêrengiya çandî û etnîkî ya sûrî di destûr de were kirin, li rex danasîna bi herdu zimanên erebî û kurdî weke zimanên fermî bin. Divê rêxistinên navnetewî fişarê bikin ku danasîn bi bawernameyên zanistî were kirin, bi rêya dîtina makenîzmeyan ji bo danasîn bi bawernameyan di herêmên cuda de were kirin bi rêya yekkirina ezmûnên destnîşankirina ast û yekkirina minhacên bêalî nesiyasetkirî ku ji aliyê hemûyan ve were pejirandin. Hin ji beşdarvanan di civatan de li Bakur Rojhilatê Sûriyê tekez kirin ku pêwîste "an danasîn bi minhacên Rêveberiya Xweser were kirin, an jî lihevkirinek derbarê minhacekî perwerdehî sabit were kirin ku tê de hilbijartina ziman serbest be"[8], û pêşkêşkirina alîkariyên madî û teknîkî ji bo minhacan û çawaniya madeya zanistî û şopandina pêşketina perwerdeyê. Tê zanîn ku pêşniyarên mamosteyan ên girêdayî bernameyên vejandina zû di perwerdeyê de bi awayekî sereke derbarê du xalan de bû, yekem ku ev bername li gorî rewşa civakî û siyasî ya Sûriyê bin, duyem; ku xwedî şaraza û rêveberiyên xwecihî bin, ji bo pêkanîna hevsengiyê di navbera dabînkirina pêdiviyên lezgîn û avakirina bingeheke xurt a geşkirina domdar a demdirêj, çaksazkirina binesaziyê û vegerandina xizmetguzariyên bingehîn, di serî de perwerde.

(7) Dema pêwîst be, em dikarin li vir sûdê werbigirin ji bo heyameke demkî di destpêkê de, tenê ji alav, proje û bernameyên perwerdeyê ku berê ji bo çareserkirina mijarên awarte an yên ji demên berê ve mane hatin bikaranîn.
(8) Ji civata Qamişloyê ku beşdarvan tê de rişd bûn ku çareseriyekê bibînin ji bo ku ji pirsgirêka cihêrengiya minhacên perwerdeyê derkevin, û ji pirsgirêka nepênasîna bi bawernameyên ji zanîngehên wan derdikevin, û tekez kirin ku pêwîst e ku baldarî li ser mafên zimanî yên kêmneteweyan di nava prosesa perwerdeyê de were kirin.

## d- Rola rêgeha prosesa siyasî û destûrê di prosesa perwerdeyê de:

Perwerde hemtayê destûr e, lewre siyasetkirina li ser yekaliya netewî ya dûrxistinê, ku di Urobetê de tê nimandin, dûrxistin e. Lewre divê danasîn bi cihêrengiya sûrî were kirin ji bo xurtkirina dewleta qanûnê ya li ser bingeha hemwelatîbûna wekhev. Her wiha divê rola rêxistinên civaka sivîl di hevgirtina civakî de were çalakkirin, û xweseriya perwerdeyê di naveroka destûr de û zagonênên wekheviyê di navbera herdu zayendan de werin misogerkirin, her wiha betalkirina hemû rengên cudahiyê yên li ser bingeha cureya civakî di naverok û axaftinê de. Her wiha kaxez pêşniyar dike ku divê perwerde dûrî ecendayên nenetewî be, û nepejirandina cudakirina bi hemû rengên wê, mafdayîna mamosteyên hatina marjînalkirin ji aliyê hiqûqî, madî û razberî ve, û piştgirîkirina xwendekarên ji xwendinê qutbûne û dûrketine, rewşa wan were çareserkirin; her wiha divê hin wane werin destnîşankirin derbarê rêzgirtina çanda kesên din, û xelkên sûrî li ser hev vekirî bin li ser bingeha maf û erkan, dijîtiya tundetûjiyê ji bo xurtkirina hevgirtina civakî. Hin axaftinan xuya kirin ku kêmasiyek di têgihîştina wan ji rola dadweriya veguhêz re heye, ev yek jî dihêle ew nepejirînin ji ber tirsa girêdayî encamên rêgeha veguhestinê ku hesab û lêpirsîn bi tewankarên cengê re li Sûriyê neyê kirin "Dadweriya veguhêz tê wateya ku kesê kuştî derbarê mafê xwe de bêdeng be.. em ê fişarê li ser kesê din bikin ji bo ku dest ji mafê xwe berde ji ber berjewendiya hemûyan"[(9)].

# Li dawiyê,

xuya bû ku gelek xal di navbera her şeş herêman de weke hev in, a herî girîng jî tekezî li ser mayîna perwerdeyê li heman dûrahiyê ji hemûyan ve, û vejandina zû yek ji gavên ku prosesa perwerdeyê geş dike be, û divê encumaneke hevbeş şêwrê ji bo rêvebirina vê prosesê di qonaxa veguhêz de were avakirin. Her wiha kaxezê dest nîşanî hejmarek ji xalên nakok di sektora perwerdeyê de kir, yên ku eger berçav neyên girtin, ê bandoreke mezin li ser kûrkirina nankokiyan di navbera pêkhateyên gelê sûrî bike, ji ber ku ew ê gelek nifşan biafirîne ku nikaribe bi çînên din ên civakê re di navê dewletê de bijî, lewre diviya ba me tevger bikira ji bo çareserkirina van xalan li rex pêşniyarên ku ji civatên guftogoyê yên berê derketine, ev yek jî nîşan dike ku divê em prosesa diyaloga sûrî-sûrî lez bikin, û xalên nakok ên girêdayî prosesa perwerdeyê deynin ser maseya diyalogê.

(9) Ji civata ku li Idlibê hatibû lidarxistin, ku yek ji beşdarvanan derbirîna tirsa xwe kir ku dadweriya veguhêz li gorî ezmûnên navnetewwyî bi vê rengî bin, lewre nepejirandina xwe ji vê rengê ji dadweriyê re da nîşan.

# Pêwîstiyên jinûveavakirina sektora perwerdeyê di qonaxa veguhestina siyasî de

## KAXEZEKE SIYASETAN

### Firstly - PÎŞEK:

Encamên lêkolîneke berê ya rêxistina Duderî[(10)] xuya kir ku komek ji cudahiyan û wekheviyan di navbera herêmên sûrî yên di bin desthilata hêzên cuda de derbarê minhacên perwerdeyê û prosesa perwerdeyê bi giştî hene; lê ferq û cudahiyên ku derketin, dest nîşan dikin ku prosesa perwerdeyê ya niha û mihanc di hin ziraviyên wê de, dê hin cudahiyan li ser asta avanî û hevgirtina civakê çêbike, ku di pêşerojê de bihêle nakokî li her sê herêmên hêzên dîfakto gur bibin, ji ber cudahiyên tund di navbera wan de, ku encamên edyolocîkirina hişmendiya tund e ku li ser siyasetkirina minhacan kar kirin. Eger em pêşketina vê rêçûnê di navbera herêmên desthilatkirî û prosesa perwerdeyê de li wir dabeş bikin, em xwe bibînin li ser pêleka pêşketina pevçûnê di civakan de ne, li gorî rêza pevçûnê ya perspetîfa derûnasiya civakî di asta berî dawî de[(11)]. Minhacên perwerdeyê yên bi teşeyê niha, dê herêmê piştî çend nifşan ber qonaxa teqînê ve bibe, ev yek jî di hin herêmên Sûriyê de yên ku hatibûn lêkolînkirin zelal bû.

---

(10) Rêxistina Duderî; "Dînamîkên dûrxistinê û zorê di sektora perwerdeyê de û bandora wê li ser avakirina aştiyê li Sûriyê", Duderî: bi hevkariya digel insiyatîfa Euro-Mediterranean, îlon 2023.
(11) Qonaxa yekemîn: ji qonaxa axaftinê bi awayekî nîgatîv li dijî komên din dest pê dike, lê ji hundir ve bê ku wê yekê diyar bikin, ew bi şerê veşartî bi hebûna têkiliyan tê binavkirin – Qonaxa duyemîn: ew cudahiya negatîv e û bê danûstandin bi kesên din re, û qonaxa şerê veşartî bi qutbûna têkiliyan – Qonaxa sêyemîn: ew cudahiya negatîv e li dijî kesên din weke neerkdarkirna wan an danûstandin pê re û standina mafên wan, bi qonaxa şerê nîv-veşirtî – Qonaxa çaremîn; ew gihandina şerê bedenî û devkî û diziya ji komên din, bi şerê ragihandî bi lêdanê tê navkirin – Qonaxa pêcemîn; ew cinosayd an tunekirin e.

Perwerde rehendek ji rehendên avakirina aştî û piştgiriya hêminiyê di heyama prosesa guherîna demokratîk û piştî wê de ye, û rolekê di çespandina çareserkirina nakokiyên civakî, xwecihî û siyasî, her wiha di pêşketina civakan de jî ye. Ev tê wateya ku sektora perwerdeyê ji bo avakirina dewletê sereke ye, nexasim di qonaxa şer de û girîngiya wê di bernameya aştiya civakî de[12]. Lêkolîneke Tora Jina Sûrî derbarê pêdiviyên jinên Sûriyê di sala 2023'an[13] de da diyarkirin ku girîngdayîna jinê bi giştî ji bo rahiştina cudahiyê li dijî wan di sektora perwerdeyê de û rola wê di avakirina aştiyê de, li hemû herêmên ku tê de lêkolîn hatiye kirin li seranserî erdnîgariya Sûriyê û li welatên penaberiyê, ew di kêmtirîn ast de bû! Ev yek jî nîşaneyeke girîng e, dibe ku em li ser ava bikin ji bo neguhpêdana mijara rola perwerdeyê di avakirina aştiyê de. Tê zanîn ku rahiştina cudahiyê li dijî jinan di minhacên perwerdeyê û prosesa perwedeyê, mijarek e beşdarî avakirina aştiya civakî[14] dibe, ji ber ku li ser xurtkirina alav, teknîk û ramanên ku dikarin cudahiyê ji nava çînên civakê rahêjin.

## Duyem - Pirsgirêk û armanc:

Li gorî pêşniyar û encamên lêkolîna Duderî ya hatiye bi bîrxistin, diviyaba nêrînên pisporan bihatiba standin ji bo ku pêşniyarên tekûztir, sergihayîtir û naverokdagirtî bihatiba wergirtin, ji bo ku bi awayekî pratîk bihate meşandin di çalakirina prosesa perwerdeyê de ji bo avakirina aştiyê di civakê de ya girêdayî prosesa veguhestina siyasî û vejandina zû, bi rêya rahiştina cudahiyê di nava minhacên perwerdeyê û prosesa perwerdeyê de, ku materyala Rêgezên Mafên Mirovan derbasî minhacê bibe ku bingeha nirxên welatîbûnê û bêcudahiya di navbera zayendan de were avakirin. Çar xalên bingehîn ku ji 16 xalan pêk tê hatin destnîşankirin, lêkolînê dît ku divê pirsa pisporan li herêmên cuda derbarê wan de were kirin.
Her wiha li vê yekê hat meyzandin bi rêya vegera li pisporan di şeş herêmên li hindirî Sûriyê, li gorî belavbûna hêzên ser erdê û cihêrengiya demografîk a sûrî di her herêmekê de, ew jî: herêma Başûr: Siwêda – Dera' / herêma Bakur Rojava: Idlib – Efrîn / herêma Bakur Rojhilat: Reqqa – Qamişlo ne.

(12) UNICEF, The Role of Education in Peacebuilding: Literature Review, New York, May 2011, P. p 17 . 19 . 22 . 25 .
(13) Sefwan Qessam, Girîngtirîn pêwîstiyên jinan li Sûriyê û hin Welatên Penaberiyê, tora jina Sûriyê "Lêkolînek nehatiye belavkirin", mijdara 2023'an.
(14) Tora Hevbeş a Ajansên perwerdeyê di rewşên awarte, perwerde jib o avakirina aştiyê, nîsan 2017 https://inee.org/ar/collections/education-peacebuilding.

**Ev lêkolîn hewl dide ku li van her çar xalan binêre:**

## Xala yekem: Materyal, minhacên perwerdeyê û vejandina derûnî-civakî, van xalan dihewîne:

1. Divê minhac û prosesa perwerdeyê ya Sûriyê niha li gorî van bingehên ku dewleta demokratîk a nûjen were avakirin be:
   - Welatîbûna wekhev
   - Cihêrengî û pirrengiya sûrî
   - Wekheviya di navbera her du zayendan de
   - Peydabûna derfetên wekhev ji her du zayendan re

2. Xweserî û bêalîtiya minhacan
3. Pêşxistina minhacan
4. Tenduristiya hişî û piştgiriya derûnî civakî.
5. Sûdwergirtin ji pisporan û tecrubeyên gelan ên ku di şer re derbas bûne û bi rêya perwerdeyê hişyar bûn.

## Xala Duyem: Samana civakî, hevrêzî, piştgirî û binesaziyê:

1. Hevrêziya niha di navbera rêxistin û saziyên perwerdeyê de.
2. Çareserkirina mijara dûrketina ji dibistanê.
3. Rêbaz û alavên perwerdeyê.
4. Berdewamiya kualîteya perwerdeyê.
5. Xurtkirina rola perwerdeyê di avakirina samana civakî de.

## Xala sêyem: cihêrengiya civakî sûrî û beşdarkirina rêxistinên navneteweyî di sektora perwerdeyê de:

1. Cihêrengiya zimanî û nijadî li Sûriyê.
2. Rola rêxistinên navneteweyî di mijara danasîna bi bawernameyan kirin de.

## Xala Çarem: Rola rêgeha prosesa siyasî û destûrî di prosesa perwerdeyê de:

1. Dadweriya veguhêz û prosesa perwerdeyê.
2. Rola destûra heyî di xurtkirina wekheviyê di navbera her du zayendan û saziya perwerdeyê de.
3. Saziya perwerdeyê û veguhestina siyasî.
4. Beşdarbûna avakirina Sûriyê:

- Geşpêdana domdar
- Vejandina zû
- Jinûveavakirin

## Sêyem - Metelojî û Çarçove:

Kaxez li sê herêman li gor belavbûna hêzên ser erdê li Sûriyê pêk hat:

- Herêmên desthilata Rêjîma Sûriyê li herêma başûr (Dera' û Siwêda).
- Herêma Rêveberaiya Xweser li bakur rojhilatê Sûriyê (Qamişlo û Reqqayê).
- Herêmên desthilata komên opozisyonê/Arêtşa Niştimanî û Eniya Rizgariya Şam li herêma bakur rojavayê Sûriyê (Idlib û Efrînê).

**Kar li ser kaxezê ji meha sibatê ve heta tebaxa 2024'an dewam kir.**

Nimûneya lêkolînê komek ji pêşengên civaka sivîl û kesên di warê perwerdeyê de li ser astên rêveberî û teknîkî yên bilind û navîn kar dikin, perwerdekarên yekser bi xwendekaran re kar dikin, girt nava xwe.
Lêkolîn li ser bingeha metelojiya şayasî analîzî û rêbaza dahûrandina civakî şopand ta bigihêje nimûneya ku ji civaka sivîl, têkildar û karkerên bi bandor di prosesa perwerdeyê de tê xwestin. Alava ku bi kar hat; civatên guftogoya tekûz bûn, ew jî nimûneyeke standard bi mebest e.

### Pîvanên amadekaran di civatên guftogoyê de:

Di her civatekê de 10 kes bûn:

#### - 6 ji saziyên perwerdehiyê bi vê awayî bûn:

3 mêr, 3 jin bi vê awayî:

1. Mamosteyên ji kardroyê di perwerdeyê de dixebitin.
2. Kesên xwedî şaraza di perwerdeyê de ji berî şerê Sûriyê ve.
3. Ji wan herî kên 2 rêveber an arasteker.

#### - 4 ji endamên civaka lêkolînkirî bi vê awayî:

2 mêr, 2 jin ku bi vê awayî bûn:

1. Pêşengên civakî têkildarî perwerdeyê bin an ji rêxistinên ku tê de kar dikin ji postên bilind bin.
2. Ji wan herî kêm 2 li gorî herêmê ji kêmneteweyên rêjeyî bin.

Nimûne li gorî vê xişteyê hat hilbijartin:

| Herêma civatên guftogoyê | | Perwerdekar/ mêr | Perwerdekar/ jin | Pêşengên mêr | Pêşengên jin | Kom |
|---|---|---|---|---|---|---|
| Herêma hikumeta Rêjîmê | Siwêda | 3 | 3 | 2 | 2 | 10 |
| | Dera' | 3 | 3 | 2 | 2 | 10 |
| Herêma Rêveberiya Xweser | Reqqa | 3 | 3 | 2 | 2 | 10 |
| | Qamişlo | 3 | 3 | 2 | 2 | 10 |
| Herêma Komên Opozisyonê | Efrîn | 3 | 3 | 2 | 2 | 10 |
| | Idlib | 3 | 3 | 2 | 2 | 10 |
| KOM | | 18 | 18 | 12 | 12 | 60 |

## Çarem – Pêkanîna Lêkolînê:

Civatên goftogoyê yên tekûz li gorî van dîrokan pêk hatin:

- Civata Idlibê 7 nîsanê
- Civata Siwêdayê 13 nîsanê
- Civata Dera'yê 16 nîsanê
- Civata Efrînê 10 nîsanê
- Civata Qamişloyê 10 gulanê
- Civata Reqqayê 18 gulanê

Belavbûna beşdarvanan li gorî piraniya rêjeyî û kêmaniya rêjeyî di her herêmekê de, bi vê awayî bû:

| Beşdarvan | Mamoste | | Pêşeng | | Kom |
|---|---|---|---|---|---|
| | Piranî | Kêmanî | Piranî | Kêmanî | |
| Mêr | 8 | 7 | 7 | 7 | 29 |
| Jin | 8 | 12 | 5 | 6 | 31 |
| Kom | 16 | 19 | 12 | 13 | 60 |

## Pêncem - Metelojiya analîzkirina civatên guftogoyê:

Nêzîkatiya metelojîk di analîzkirina civatan de, xwe spart dabeşkirina her şeş herêman di nava sê koman de, ew jî: (Idlib – Efrîn), (Qamişlo – Reqqa), (Siwêda – Dera'), li gorî cîraniya erdnîgarî û nêzîkbûna çandî û siyasî, her wiha minahiya di pêkhateya mirovî û hêzên desthilatdar di nava komekê ji van koman de; û rêzkirina bi vê awayî bû:

**1- Idlib:** tê de nêzî 5.1 milyon kes dijîn, 3.4 milyon ji wan ji herêmên Sûriyê yên cuda koçber bûn. Rewşa wan ê jiyanî lawaz e, derfetên ku veguhêzin cihekî din nîn in, û 2 milyon ji wan di kampan de dijî, milyonek zarok derveyî perwerdê ne[15]. Hêzên desthilatdar îslamî radîkal in, digel hebûn kêmekên Dirzî û Xiristiyanî, lê belê hema bêje nayên xuyakirin û rastî rewşên dijwar tên. Bi giştî, civaka li Idlibê, civakeke di bin mercên minahî civaka Efrînê de dijîn, ji aliyên leşkerî, siyasî û idyolojîk ve. Hêzên desthilatdar ji paşxaneya xwe ya edyolojîk ve destwerdana prosesa perwerdeyê bi awayekî bingehîn kirin.

**2- Efrîn:** berê piranî 95% [16]kurd bûn, lê îroj jimartineke tekûz di vê herêmê de tune ye ji gava dagirkirina wê ve ji aliyê Tirkiyê sala 2018'an bi hevkariya hin komên tundrew ve. Hêzên desthilatdar ên niha yekser girêdayî Tirkiyê ne û komên radîkal ên îslamî yên girêdayî wê di bin navê "Artêşa Niştimanî". Niha tevna civakî kêmneteweyeke kurd dihewîne ku berê ew piranî bû, berî ku bi darê zorê werin koçberkirin û xanî û milkên wan werin desteserkirin. Ev piraniya berê û kêmaniya niha nêzî pêkhateya Qamişlo ye ji aliyê hişmendî û niştecuhî ve[17]. Hêzên desthilatdar ji paşxaneya xwe ya hişmendî ve destwerdana prosesa perwerdeyê ji binî ve kirin.

**3- Qamişlo:** ji destpêka şoreşa Sûriyê ve hêzên rêjîmê ji Qamişloyê vekişîn, lê hin çargoşeyên ewlehiyê hiştin, piştre herêm di pevçûnên bi Daişê re derbas bû, piştre Rêveberiya Xweser lê bi cih bû. Tevna civakî ji şebengên etnîkî û olî cihêreng pêk tê, lê piranî kurd in, Reqqa jî di bin serweriya Rêveberiya Xweser de ye tevî ku di tevna civakî de naşebihe wê. Hêzên serwer ji paşxaneya xwe ya hişmendî ve destwerdana prosesa perwerdeyê bi awayekî bingîn kirin.

**4- Reqqa:** li Reqqayê tunditirîn ceng ji aliyê hêzên hevpeymana navneteweyî ve li dijî Daişê hatin kirin, hişt ku gelek kes koçber bibin û werin kuştin berî ku Rêveberiya Xweser bibe serwer bi hevkariya hevpeymana navneteweyî sala 2017'an. Piraniya wan ereb in, di avaniya xwe de nêzî piraniya giştî di nava tevna sûrî de ye. Hêzên desthilatdar ji paşxaneya xwe ya hişmendî ve destwerdana prosesa perwerdeyê bi awayekî bingehîn kir. Tecrubeya Reqqayê ya perwerdeyê ya

(15) OCHA, raporek derbarê rewşa li bakur rojavayê Sûriyê, 16 gulanê 2024, https://reports.unocha.org/
(16) Ne'so; Guhertina Demografîk li herêma Efrînê (nêrîneke qanûnî), 1 sibatê 2019.
(17)HRW, Syria Events of 2022,  https://www.hrw.org/ January 2022.

herî veguhêr e, ji ber guherîna hêzên desthilatdar ji Be's, Artêşa Azad û Cebhet El-Nusra, piştre Daiş, ku hişt gelek kesên pispor werin koçberkirin, û guhertineke mezin di niştecihan û awayê hişmendiyê de çêbû, heta Rêveberiya Xweser hat û siyaseta xwe ya perwerdeyê ferz kir.
**5- Siwêda:** di bin desthilata rêjîma Sûriyê de ye, lê hin komên xwecihî yên opozisyonê hene ku xwepêşandanên li dijî rêjîma Sûriyê diparêzin, bi awayekî rojane ji 17 tebaxa 2023'an dewam dikin. Niha li wir bi sedhezaran penaber ji herêmên din ên Sûriyê lê hene. Pêkhatina piraniya xwecihî ji piraniya heyî li tevna sûrî yên din mezintir e, ji aliyê erdnîgarî ve nêzî civaka Dera' ye. Hîna sîstema perwerdeyê ya fermî serwer e, tevî ku hin têbîniyên civaka xwecihî li ser hin mijarên girêdayî siyaseta partiya Be's e.
**6- Dera':** di bin desthilata rêjîma Sûriyê de ye, lê bi awayekî ji awayan xwedî xweseriyek e, ji ber hebûna opozisyona ku di dirêjahiya salên berê de parêzgeh xistibû bin serweriya xwe, pêkhatina piraniyê tê de weke piraniya heyî li tevna sûrî ya din e, bi awayê mercî hevbeş bi herêmên di bin desthilata rêjîmê de ye. Hîna sîstema perwerdeya fermî serwer e, tevî hin têbîniyên civaka xwecihî derbarê hin mijarên girêdayî siyseta partiya Be's.

**Sembolkirina civatan:**

Civata Idlibê = CI
Civata Efrînê = CE
Civata Qamişloyê = CQ
Civata Reqqayê = CR
Civata Siwêdayê = CS
Civata Dera'yê = CD

Ji aliyê analîzkirina naverokê ve, me encamên civatan bi awayekî nivîskî wergirtin, piştî xwendinê û destnîşankirina ramanên girîng ku tê re derbas bûn, em vegeriyan çar xalên analîzkirinê, û mijarên vekirinê ku di bin de hatin diyarkirin, hejmara wan jî 16 mijar in, ew ên ku di dosyayên civatên guftogoyê de em lê geriyan, li gorî du tewereyên bingehîn: Çi heye û çi divê bibe;[18] Ango divê em ji têgihîştin û analîzkirina rewşa heyî ve dest pê bikin ber bi avakirina nêrînekê derbarê çi divê di pêşerojê de bibe.
Piştre, alava analîzkirina taybet bi xişteyan hat sazkirin, û dest bi nivîsandina rapora civatan hat kirin bi rêya karanîna vê alavê, ta ku bigihêjin derencaman.

(18) Li gor rêgeza " Immanuel Kant" di têgihîştina xwe ji zanîna teorî û zanîna pratîk re, weke ku di pirtûka xwe "Rexnekirina aqilê sade".

## Şeşem – Encamên Civatan "Çi hebû":

### Tewereya yekem
### Materyal û minhacên perwerdeyê, û vejandina derûnî-civakî

Materyal û minhacên perwerdeyê roleke girîng di prosesa avakirina aştiyê de dilîzin bi rêya xurtkirina hişmendî û hevtêgihîştinê di navbera kesan û civakan de, vejandina derûnî-civakî ku rênîşanderên civakî û derûnî li dibistanan pêşkêş dikin, beşdarî xurtkirina hêminiya derûnî û bengî ya şagirt û mamosteyên ku ziyan ji şer dîtine dibe. Ev yek hawîrdoreke perwerdehî ava dike ji bo ku bibe piştgir di avakirina civakên bêtir efûker û armatir bin:

### 1- Derbarê peydakirina minhacan û prosesa perwerdeya sûrî ya niha ji bingehên ku li ser wê dewletên demokratîk nûjen ava dibin.

Ev bingeh jî ev in:

**Hemwelatîbûna wekhev:** tê wateya misogeriya ku hemû hemwelatiyên sûrî xwedî heman maf û erk in bê cudahî li ser bingeha nijad, zayend, ol, an hêmanekî din; ev têgîn wekheviya di parastina qanûnî de û beşdariya tam di jiyana civakî, siyasî û aborî de xurt dike.(19)

**Pirrengî û cihêrengiya sûrî:** Sûriyê xwedî têkileke dewlemend ji çand, ol û neteweyan e, yên ku di dîrokê de di nava tevneke civakî aloz de bi hev re jiyan kirin ku vebeyîna cihêrengiya nijadî û olî ye; weke ereb, kurd, asûr, ermen, dirzî, elewî, xiristiyan û hwd.. Têgihîştin û pejirandina pirrengiya li Sûriyê dibe alîkar di çesipandina wê de, û beşdariya xurtkirina têkiliyên civakî û hokirina lihevkirin û hevkariyê di navbera komên cuda de, tevî astengiyên siyasî û aborî ku welat têrederbasdibe.(20)

**Wekhevî di navbera herdu zayendan de:** ew beşeke ji qanûna navneteweyî bi Ragihandina

(19) Hessan El-Eswed, Hemwelatîbûna Wekhev, navenda Heremon, https://www.harmoon.org/ , 5 mijdarê 2021.
(20) Ehmed Qurbî û Newres El-Ebdelah, Ronahî li ser rêveberiya cihêrengiyê li Sûriyê – Di Pêwîstiya Hişmendiya Neteweyî bi Hemwelatîbûnê re, Navenda Diyaloga Sûrî, 11 îlonê 2023. https://sydialogue.org/

Cîhanî ya Mafên Mirovan tê naskirin a ku Komaleya Giştî ya Netewên Yekbûyî di 10 berfanbara 1948'an de ji xwe re kir bingeh, û sala 1979'an Komaleya Giştî Peymana Hilweşandina Hemû Teşeyên Cudahiyê li Dijî Jinê "CEDAW"(21) erê kir, a ku hikumeta Sûriyê sala 2002'an li ser îmze kir, lê li ser hin bend û madeyan erê nekir, vê yekê hişt ku peyman ji naveroka xwe vala derkeve, û qanûnên wê di vê pêvajoyê de dereng bimînin.

**Peydabûna derfetan ji herdu zayendan re:** ew rêgezeke bingehîn e ji rêgezên wekheviya zayendî di hemû waran de, ji wan jî perwerde, û stratejiyeke girêdayî stratejiya giştîkirina perspektîva cureya-civakî ye, ew jî vebeyîna asta xurtkirina rewşa jinê di civakê bi giştî û perwerdeyê de bi taybet.(22)

Di heyama civatan de, minahiyek di navbera Idlib û Efrînê de derket, ku hêzên desthilatdar hemû tiştên dest nîşanî van têgehan dikin, ji minhacên xwe rahiştin, û çavên xwe bi mebest li ser pêkhateyên Sûriyê girtin. Sedema vê rahiştinê wisa gotin: **"Erka Salih El-Elî(23) ew bû ku hejmareke mezintir ji welatiyên sûrî ji pêkhateyên sunnî (kurd û turkmen)'an ji rêzeçiyayên Elewiyan koç bike, ji bo ku bibe herêmek ji pêkhateyeke tenê"(24)**, mebesta pêkhateyeke tenê ango hemû niştecih Elewî bin, lewre li gorî vê yekê bi bîrxistina Salih El-Elî hat rahiştin! Redkirina mamosteyan ji vê siyasetê re veşartî bû, bi rêya rexnekirina minhacên hêzên desthilatdar li herêmên cuda yên ku minhacan derbasî siyasetê dikin li gor berjewendiyên xwe(25), lê belê ev rexne dibe ku teşeyek ji teşeyên hicetgirtina siyaseta li Idlib û Efrînê li gor rêgeza: "Madem hemû bi vê karî di herêmên xwe de radibin, çima ez jî wisa nakim?!".

Pejirandin û redkirina van têgehan li Idlibê zelal bû, ji ber encamên cuda yên helwesta civakê ji hêzên desthilatê xwedî paşxaneya îslamî radîkal ku van têgehan red dikin, berûvajî Efrînê ku pê bang dike û dixwaze pêk bîne, ji ber ku civak van têgehan qebûl dike, berûvajî hêzên desthilatdar ku napejirînin.

Lê belê hin beşdarvanan li Idlibê hicet girtin ku pirrengî niha ne gengaz e: **"Çawa ez ê şagirtan bidim bawerkirin, û ew hemû cureyên êşkenceyê ji pêkhateyekê dibîne"(26)**, ji ber ku tundiya dewletê (rêjîmê) di asta yekem de xwe bi pêkhateyekê ve girêda, ev yek jî ji aliyê civakê ve nayê qebûlkirin, ger sernîşanên rêjîmê û sûcdarên şer neyên darizandin; û dibînin ku ev hacet

(21) Netewên Yekbûyî, Dozên Cîhanî: Wekhevî di navbera herdu zayendan de, https://www.un.org/
(22) ESCWA, Wekheviya zayendan, ESKWA, 2022, https://www.unescwa.org/ar/sd-glossary
(23) Salih El-Elî: ji şoreşgerên Sûriyê ye li dijî dagirkeriya Fransî, şoreşek li parava sûrî li çiyayê Elewiyan ji sala 1918'an ve bi rêve bir, û navê wî ji minhacên perwerdeyê li bakur rojavayê Sûriyê, ji ber ku ew ji çîna Elewî ye ku di refê rêjîma Sûriyê de tê hesibandin, sedema rahiştinê şaştiyeke dîrokî ye, ev sedem li ser gelek guhertinan tê sepandin ln ku derbasê pirtûka Dîrokê kirine li gor paşxaneya mezhebî.
(24) CI
(25) CI+ CE
(26) CI

divê ji civaka resen derkevin, bi merca ku çanda tundiyê bi taybet li dijî jinan neyê çesipandin. Amadekarên civata Efrînê li pirrengiyê bi awayekî din girêdayî nijada kurd dinêrin: **"Ez weke kurdekî, bi carekê xwe di materyala Netewî (Weteniyê) de nabînim, ez bi carekê winda me, ji min re tarî ye, li ba me di minhacan de tenê Urobe û lehengên Urobe hene"(27).**

Lê belê li Qamişloyê, hin kesan dîtin ku ev bend bendên siyasî ne, û derbirîna pêwîstiyên civakê bi xwe an perwerdeyê nakin, yek ji wan dest nîşan dike ku: **"Minhacên sûrî ji gava ku ez zarok bûn, pêwîstî bi pirnetewebûnê heye.. ew neteweyekê li ser hesabê neteweyeke din bilind dike, danasînê bi netewe û pêkhateyên din ji bilî pêkhateya ereb nake"(28)**, banga pêwîstiya siyasetkirina perwerdeyê kir ji bo pêkanîna berjewendiyên desthilata serwer.(29)

Nêrîneke din dît ku siyasetkirina perwerdeyê deriyeke ji hêzên tundrew re ye; ji ber ku ew mafê didiyê. Di heman demê de, hin kesên din jî dibînin ku siyasetkirin divê di nava perwerdeyê de qedexe be ji bo misogerkirina bêalîtiya wê(30). Yekî din cudahî xist nava siyaseta ku xizmetî dewletê dike û siyaseta ku xizmetî desthilatê dike, dît ku siyaseta ku daxwaza van pêwîstiyan dike, ew siyaseta ku xizmet dewletê dike, ne xizmetkarê desthilatê ye.(31)

Mijar li Reqqayê ne cuda bû, ji goşeya nêrîna li van xalan (ango bingehên ku dewletên demokratîk li ser ava dibin), hin beşdarvanan di civata Reqqayê de dîtin ku ev xal ji civakê cuda ne, an li pey ecindayên siyasî cuda dimeşin. Ev nêrîn di her du civatên Siwêda û Dera'yê de derbas bû, li beramberî hin nêrînên ku daxwaza pêwîstiyeke bilez û girîng dikin ji bo avakirina dewlet û aştiyê. Zelal bû ku ferzkirina van ramanan ji aliyê hêzên desthilatê ve di minhac û perwerdeyê de, roleke xwe di nepejirandina hevdu re heye, weke ku rewş li her du civatên Siwêda û Dera'yê (ên ku ziyan gihandin pirrengiyê, welatîbûnê û wekheviyê ku di minhacê de propeganda dihat kirin ji ber ku ew ji Be's û rêjîma Sûriyê derketiye), hin ji beşdarvanan di civata Reqqayê de derbe lê dan ji deriyê ku ew "Dewreyên Ramyarî" edyolojîk in, desthilatên ser erdê li ser mamosteyan û civakê ferz dikin, lê ew ne guncavî wan in.

Hin beşdarvanên ji Siwêdayê dest nîşan kirin ku ev têgeh ji naveroka xwe vala ne, weke tê xwestin nagihêje şagirtan; hin kesan jî gotin ew tune ne, lê belê, minhacên niha rola jinê ya nimûneyî diçesipîne, ew jî nîşanî cihêrengiya sûrî nake.

(27) CE
(28) CQ – yek ji pêşengên civakî yên girîngî didin perwerdeyê.
(29) Siyasetkirin, li vir li gorî nêrîna axêver li gorî fikra "Stalînî-Navnetewî".
(30) CQ – axêver nûnerê yek ji kêmneteweyên girêng li herêma bakur rojhilatê Sûriyê ye.
(31) CQ

Li Dera'yê, hin kesan dest nîşan kirin ku minhac van hêman dihewîne, û qanûn maf dide mêr û jinê û kêmneteweyan jî, li gor rewşê jinê derfeta xwe di kar de standiye, ji ber ku civak niha bi haceta mêran e bi sedema mercên ewlehiyê: "Li ba me cendereya mecbûrî ye; rêjeya bilind ji karker û karmendan di dewletê de, ji ber mercan jin in".

## 2- Xweseriya minhacan û bêalîtiya wê:

hemû civatan li hev kirin ku minhacên perwerdeyê ku li herêmên wan tên xwendin siyasetkirî ne. Hin bersiv ji pirsan reviyan derbarê mekanîzmeyên karên aliyên ku siyasetkirinê di prosesa perwerdeyê de dimeşînin, armanc jê temsîlkirina paşxaneya desthilatê di prosesa perwerdeyê de ye; siyasetkirin teşeya cudakirinê di navbera xort, keçan, jin û mêran di warê perwerdeyê de distîne, ji refê yekê heta saziyên perwerdeyê, an guhertina hin hûrguliyên minhacan, rahiştin û zêdekirinê li gor nêzîkbûna agahiyan ji siyaseta heyî ve. Li bakur rojhilatê Sûriyê, rewş cuda bû, ji ber ku siyaseta komkirina xort û keçan di dibistanekê de hat ferzkirin, tevî ku li dijberî çanda civakê be jî, û guhertina xwendinê ji zimanê erebî ta kurdî li hin herêman, û guhertin di minhacên dîrok û erdnîgariyê de li gor desthilata li ser erdê ye.

Lê li Siwêdayê, mamoste li hember siyasetkirina prosesa perwerdeyê ya fermî sekinîn, lê danasîna bi bawernameya ji aliyê rêjîma Sûriyê ve, li ser şagirtan ferz dike ku materyala Netewe (Qewmiyê) ji ezmûnên bawernameyan bixwînin, lê mamosteyan hin rê û rêbaz dîtin ji bo hînkirina vê materyalê ya ku desthilata Be's li ser şagirtan[32] kêm bike; û danasîna bi bawernameya zanistî kaxeza fişarê ye li ba rêjîmê li hemû herêmên derveyî desthilata wê.

## 3- Pêşxistina minhacan:

li hemû herêman komîte hene li ser pêşxistina minhacan kar dikin, her yek li gor herêma xwe. Hin alî serpereştiya vê prosesê û komîteyan dikin, ev dihêle ku cudakirin di navbera minhacan û zemînê de were kirin, û şaştî di minhacan de derkevin. Hin kesan di nêrînên xwe de dan diyarkirin ku dibe ku federalizma perwerdeyê bibe rastiyek li Sûriyê, digel parastina xalên sereke yên navendî ku hevgirtina dewlet û gel biparêze.

## 4- Tenduristiya hişî û piştgiriya derûnî civakî:

girîngiya çalakkirina rola pîşeya rênîşandêrê/a civakî derûnî li dibistanê di şopandina vejandina derûnî û hişî li ba şagirtan, bi taybet rewşên ku êşê ji tevliheviya derûnî dikişînin ku ji encamên şer û şokên derûnî, û beşdarî di pêkanîna bernameyên piştgiriya derûnî û tevlêkirina civakî.
Civatan dan diyarkirin ku karê rênîşandêrê/a derûnî û civakî li dibistanan heta niha karekî teşeyî ye, ne çalak e, tenê li gor şiyan û derfetên rênîşandêr û mercên dibistanê bi xwe û hevkariya

(32) CS

mamoste û rêveberiyê ye. Rêveberiyan û kadroyên perwerdeyê qebûl nakin, carinan heta xwediyên şagirtan jî destwerdana rênîşandêran qebûl nakin, ên ku bi giştî hewcedarî teknîk, alav û amûrên pêwîst in ji bo berdewamiya pîşeya xwe.

Hin kes jî li erka rênîşandêr dinêrin weke kesekî ji partiya Behs hatiye valakirin ji bo vehese, digel lawazî di têgihîştina rola rênîşandêrê/a civakî û derûnî li dibistanê û sînorên erkên wî/wê.
Li Idlib an Qamişlo rênîşandêr li dibistanan tune ne, lê belê li dibistanên ku piştgiriyê ji rêxistinan digirin, pisporiya parastina zarok li şûnê hat danîn; ew jî bi giştî delameteke demkî ye girêdayî domdariya fînanseyê ye, ne merc e ku pispor be ji bo di vê delametê de kar bike. Lê belê li Efrînê, hin dibistan rênîşandêran erkdar dikin bê ku bawernameyên xwe guncavî vê karî bin[33]. Li Qamişloyê jî, beşa derûnasî li Zanîngeha Rojava ji bingeh ve tune ye ku rênîşandêran erkdar bikin[34]. Li Dera'yê, çalakiya vê delametê sînordar e digel lawaziya alavên rênîşankirinê ku ne guncavî rewşa dijwar û pirsgirêkên aloz e.[35]

### 5- Sûdwergirtin ji şaraza û tecrubeyên gelên ku di şer re derbas bûne û bi rêya perwerdeyê hişyar bûn:

tecrubeya Rawandayê hat bi bîrxistin a ku ji nû ve sîstema perwerdeyê ava kir, û tekezî li ser jinûveavakirina tevna civakî kir, bi rêya bernameyên perwerdehî û çandî ku armanc jê xurtkirina yekîtiya neteweyî û hevtêgihîştin e, xurtkirina minhacên perwerdeyê ku aştî û efûkirinê dide pêş, bernameyên rahênana mamosteyan, bernameyên perwerdeya nerêxistinî, beşdariya civakî di perwerdeyê de; û tecrubeya Başûrê Efrîqiyayê ku hin wane derbarê lihevkirinê û jiyana aştiyane derbasî minhacên perwerdeyê kir, rêxistinkirina kampaniyên hişmendîkirinê ji bo xurkirina nirxên efûkirin, dadwerî û welatîbûnê, piştî şerê navxweyî, û xurtkirinê perwerdeya ku hemû digire nava xwe bi beşdariya civakê, û perwerdekirina mamosteyan li ser minhacên nû yên ku ji bo xurtkirina lihevkirina neteweyî hatin çaksazkirin.[36] [37] [38]

(33) CE
(34) CQ+ CR
(35) CD
(36) Mazen Neqaşe; Jınûveavakirina Avaniya Nasnameya Neteweyî ya Sûrî di qonaxa piştî şer de: analîzkirina rola çandê bi perwerdeyê, lihevkirinê û tecrubeyên navneteweyî, Nameya Master, Dibistana Bilind a Rojnamegeriyê û Pêgihandinê, Parîs, Dezgeha Têkiliyên Navneteweyî, 2024, R 58, 59
(37) UNESCO, Education for All 2000-2015: achievements and challenges; EFA global monitoring report, https://unesdoc.unesco.org, 2015,
(38) World Bank group, Republic of South Africa Systematic Country Diagnostic, https://documents1.worldbank.org/ , April 30, 2018, P - p 53 - 57.

Civatan, tecrubeya Japoniyayê bi bîr xistin gava ku ji mamoste re parastina împrator û mûçeya bijîşk hat pêşkêşkirin. Li Polandayê jî gava perwerde veguhest pratîk li şûna teorî. Di hin kantonên Almanyayê de, civak ew rêveber e û mamosteyan dest nîşan dikin, ew bi biryareke rêveberî nayên erkdarkirin, û tecrubeya Malîzyayê, Polanda, Bosna û Hersêk jî wisa ye.

## Tewereya duyem
## Samana civakî, hevrêzî, piştgirî û binesazî

Samana civakî bi hêsanî rê dide kesan ji bo çareserkirina pirsgirêkên xwe yên civakî, û derfetên pêşketin û geşkirinê hêsan dike, beşdarî geşkirina astên hişmendiya civakî li ba neferan dibe. Sê hêman beşdarî avakirina samana civakî dibin: rêxistinkirina civakî, avahiya civakî û geşpêdana mirovî[39]. Pirsgirêk ew e ku perwerdeya niha beşdarî avakirina samana civakî li Sûriyê nabe.

### 6- Hevrêziya niha di navbera rêxistinan û çarçoveyên perwerdehiyê de:

bi giştî roleke neyinî ya rêxistinan di perwerdeyê de heye, ji ber ku domdariya projeyên xwe demkî ne û girêdayî fînansekirina aliyên daner in; ji ber ku siyaseta xwe ne li gorî pêwîstiyên xwecihî ne. Digel wê, kadroyên perwerdeyê ji dibistanên fermî hatin vekişandin, ji ber ku rêxistin di dibistanên xwe de mûçeyên gelek baş didin mamosteyan, berûvajî mûçeyên dibistanên fermî, vê yekê hişt ku mamoste di sektora fermî de bi dûrketinê bihesin. Hevrêziya van rêxistinan digel desthilatan li Idlibê û li bakur rojhilatê Sûriyê lawaz e[40]. Li beramberî wê, hevrêziya wan bi hikumeta rêjîmê re pir bilind e, ku nalivin bê erêkirina wê. Yek ji beşdarvanan di civata Idlibê de derbirîna nebûna hevrêziyê di herêma wî de got: **"Pirsgirêka bingehîn ku li ba me du wezaret û du hikumet hene, û hikumeteke zordar li Şamê heye, li ba me hin kes hene ji UNESCO me hikum dikin û tevlihevî li ba me heye"**[41].

Di navbera erêniyên karê rêxistinan de ku wan piştgiriyek dan perwerdeyê ne kêmtirî perwerdeya fermî ye, bi rêya piştgiriya dibistan û şagirtan bi alavan û amadekirina binesaziyê, şopandina şagirtên dûrketî, dewreyên Kêrhatina xwendinê, dewreyên piştgiriya perwerdehiyê, şopandina

(39) Dr. Ela Elî Elî El-Ze'l; Pîvana Samana Cıvakî, kovara lêkolînan di xizmeta civakî de, hejmar 55, C 3, hezêran 2021, R 774, 767.
(40) Tevî ku wan ruxset standiyê, lê pirî caran baca jî didin.
(41) CI

perwerdekirina xwedî kêmendaman, û ji bilî wan ji perwerdekirina çîneke fireh ji civakê di her cihî de.

UNESCO û UNICEF dikarin xwedî rolek bin ji bo ku fişarê li rêjîmê û dewletan bikin ji bo danasînê bi bawernameyên zanistî ku ji herdu herêmên Idlib û bakur rojhilatê Sûriyê bikin.(42)

## 7- Çareserkirina mijara dûrketinê ji dibistanê:

civatan dan diyarkirin ku karê li ser mijara dûrketinê bi giştî li hemû herêmên desthilatan lawaz e, ji desteyên perwerdeyê yên girêdayî hêzên desthilatdar pirtir ji rêxistinan re tê hiştin ku pê rabin. Pêdewistiyên perwerdeyê li Idlibê û bakur rojhilatê Sûriya da diyarkirin ku hevrêzî di navbera hêzên desthilatdar û rêxistinan de pêwîst e ji bo pêkanîna vê karî(43). Her wiha li herêmên rêjîmê jî çînek ji nifşên dûrketî ji perwerdeyê derket bi sedema mercên dijwar, ew tevlî refên li pêş bûn, tevî valahiyeke perwerdehî, ew jî çîneke rastî gefa dûrketineke nêzîk tê.(44)

## 8- Rêbaz û alavên perwerdeyê:

hokirin (ku tê de carinan diyalog heye), rêbaza herî navdar e di nava rêbazên perwerdeyê de; tiştê wê xurt dike bilindbûna hejmara şagirtan di fêrgehan de, tiştê ku bihêle bikaranîna rêbazên din di perwerdekirinê de mijareke dijwar be, dibe ku dema materyalê bi xwe bê ku rêbaz temam bibe. Her wiha lawaziya şarazayê û derfetên mamoste, nebûna alav û derfetan li dibistanan ji bo kirîna amûrên şîrovekirin û perwerdekirinê, nebûna binesaziyê weke elektrîk, labretor û alavan, aliyê hînkirinê di prosesa perwerdeyê de xurt dike; hin kes dibêjin ku mijar bi desthilatê ve girêdayî ye, ji ber ku **"Girîngiyê nadin fêrbûna rêbazên nû, lê belê girîngiya sereke ji dewreyên ramyarî û prosesa guherîna edyolojîk e. Ferzkirina edyolojî li gorî hêzên desthilatdar ji sîstema perwerdeyê bi giştî girîngtir e"**(45). Diyar bû ku hemû rêbaz berê xwe didin perwerdekirina şagirtên tendurist, kêmcaran em dibînin berê xwe didin astengdaran.

Şêwaza sizakirin û lêdanê li dibistanan kêm bû(46), her wiha rêbazine din hene carinan tên bikaranîn weke lîstokên zîrekiyê, vekirin û siwarkirin, lê ew li dibistanên taybet hene.

## 9- Domdariya kualîteya perwerdeyê:

amadekirineke guncav û dewrî ji kadroyên perwerdeyê re tune ye, heta mihancekî nû hebe an guhertinek di minhacê kevin de hebe, mijarên van dewreyan pirî caran li gorî siyasetên hêzên

(42) CI + CQ+CR
(43) CI + CQ
(44) CS
(45) CR – Axêverê rexne li rewşa ku tê de raman cudayî ramanên civakê ne bi rêya van dewreyan li ser hesabê başkirina mercên din.
(46) Tevî hebûna teşeyên din ên zorê, ji wan zora derûnî.

desthilat in; û astên mamosteyan di dema niha de gelekî lawaz e, kêm kesên ku li ser pêşxistina şarazayên wan dixebitin hene.

### 10- Xurtkirina rola perwerdeyê di avakirina samana civakî de:

perwerdeya niha tekezî nade avakirina samana mirovî, ji ber ku ev perwerde ji zemîna niha cuda ye, armancên xwe bi giştî cudayî armancên geşkirinê ye ku xizmet civakê dikin, ji ber ku geşkirin li hemû herêman hat mecbûrkirin ji bo ku xizmetê ji desthilatan re bike, rêveçûna heyî bi giştî, di nav de jî rêveçûna civakî: **"Tekezî nade zêdekirina dibistanan, lê dide zêdekirina mizgeftan"**(47). Ev rêveçûna giştî, beşdarî valakirina Sûriyê ji samana xwe ya mirovî dibe, ji ber ku zemîneke guncav peyda nake ku sûdê bide aliyê jiyanî, bi taybet bi nebûna plankirina stratejîk ji bo girêdana derencamên perwerdeyê bi bazara kar ve, lê belê şagirt di rewşa windahiyê û şerpezebûnê de ne, di navbera rastiyê û dibistanê, xwediyên wan û pêşerojê de: **"Ji min re xuya ye ku şagirt weke xala rêkêşanê ye; rêveber ji aliyekî ve dikişîne, razgir ji aliyekî ve, mamoste ji aliyekî ve, û xwediyê wî/wê ji aliyekî din ve dikişîne.. li dawiyê tu dibînî ku ew parçe ye ji hev qetî ye, nizane ku ve biçe"**(48).

## Tewereya sêyem
## Cihêrengiya civakî sûrî
## û beşdariya rêxistinên navneteweyî di sektora perwerdeyê de

Sûriyê xwedî cihêrengiyeke zimanî, nijadî û olî ye, vebeyîna dîroka xwe ya dirêj û çandên cihêreng ên ku tê de niştecih bûne ye. Niştecihên wê bi erebî, kurdî, ermenî, suryanî, tirkî, çerkesî û zimanên din diaxivin, digel zimanên xwecihî yên din. Ev cihêrengî parek ji nasnameya sûrî ya aloz e ku di heyama sedsalan de ji koçberî û hewldanên çandî yên cuda(49), pêwîst bû ku bihatiba hişyarkirin derbarê berçavgirtina vê cihêrengiyê di prosesa perwerdeyê li Sûriyê, û makenîzmeya destwerdana rêxistinên navneteweyî bi herdu beşên xwe yên mirovî û sivîl ji bo çareserkirina pirsgirêka danasîna bi bawernameyên zanistî yên ji saziyên perwerdeyê cuda derketine:

### 11- Cihêrengiya zimanî û nijadî li Sûriyê:

şagirt li hin herêman zimanên erebî, tirkî, kurdî, ingilîzî û carinan jî fransî dixwînin, ev yek jî giran

(47) CE – Di rexnekirinekê ji axêverekê ji bo belavbûna şepêla olî tundrew.
(48) CD: Ev hevok li ser zimanê rêveberê dibistanekê li Derayê hat.
(49) Ehmed Qurbî û hevalê wî, referansa berê, 11 îlonê 2023.

e. Li bakur rojhilatê Sûriyê kar li ser derxistina minhacên perwerdeyê bi sê zimanan; erebî, kurdî û suryanî, tê kirin, xwediyên şagirtan minhacên ku dixwazin zarokên wan bixwînin hildibijêrin. Derket holê ku pejirandinek heye ji bo xwendina bi zimanên ji bilî erebî di perwerdeya fermî de, tevî ku hin caran ji xwendina bi zimanê kurdî aciz dibin.(50)

## 12- Rola rêxistinên navnetewî di mijara danasîna bi bawernameyan kirin de:

danasîneke navneteweyî bi minhacên perwerdeyê li Idlib û bakur rojhilatê Sûriyê tune ye, ne jî danasînê bi bawernameyên ji wan herêman derdikevin dikin(51); ji ber ku danasînpêkirin tê wateya danasîna bi hêzên ser erdê ye ku wan bawernameyan derdixin. Nedanasîna bi wan bawernameyan li wan herêman, hişt ku şagirt ji prosesa perwerdeyê dûr bikevin, di saya mijdomaniya sûda perwerdeya girêdayî bawernameyên bêdanasîn. Tevî ku UNESCO dest werdan kir di danasîna minhacên hikumeta Itîlafê (Hikumeta Sûriyê ya Demkî), lê belê danasîn bi bawernameyên wan nayê kirin. Qeterê pirtûkên dibistanan ên Idlibê û gundewarê Helebê çap dikir, lê îroj Tirkiyê wan çap dike bê ku zanibin daner kî ye.(52)

Dibe ku siyaseta perwerdeya niha li ba Rêveberiya Xweser sedema têkçûna perwerdeyê ye, û koçberbûna şagirt û xwediyên wan ta parêzgehên din an derveyî welat, ji bo parastina pêşeroja zarokên wan, ji ber ku bawernameya ku Rêveberî dide danasîn pê nayê kirin, ne li dewleta Sûriyê û ne jî li dewletên cîran.

# Tewereya Çarem
# Rola rêgeha prosesa siyasî û destûrê di prosesa perwerdeyê de

Çarçoveyên qanûnî û rêxistinî yên sîstema perwerdeyê ji aliyê xwe ve minhacên xwendinê dest nîşan dikin, jêderên diravî û mirovî yên pêwîst ji bo misogerkirina peydakirina perwerdeyeke xwedî kualîteyeke bilind ji welatiyan re; pirî caran destûr li ser mafê xwendinê û destnîşankirina berpirsiyariyên dewletê di vê heyamê de disekine, lê belê prosesên siyasî beşdarî pêşxistina siyasetên perwerdeyê û çaksazkirina wê dibin, li ser bingeha guherînên civakî, aborî û pêwîstiyên nûjenkirî yên civakê.

(50) CE + CQ + CR
(51) CI + CQ + CE
(52) CI + CQ + CE

## 13- Dadweriya veguhêz û prosesa perwerdeyê:

dadweriya veguhêz di rewşa Sûriyê de hin rêkariyan werdigire, weke peyketina dawerî, sazkirina komîteyên rastiyê, bernameyên qerebûkirinê û destnîşankirina ziyanan, çaksazkirina saziyan, lêpirsîn, lihevkirina civakî, serbestberdana girtiyan û vedîtina çarenûsa kesên windayî... prosesa perwerdeyê girêdayî dadweriya veguhêz bi rêbazên cihêreng; perwerde dikare bibe alaveke girîng ji bo pêkanîna armancên dadweriya veguhêz ku tekezî li ser perwerdeya wekhev û sergihayî were kirin, xwendina materyala Dîrok bi zelalî, perwerdekirina mamosteyan û efûkirina wan, berçavgirtina rewşa şagirtan û ji bilî wan.(53) (54) (55)

Hin beşdarvanan têgeha dadweriya veguhêz red kirin, ji ber ku li gorî wan û têgihîştina wan tê wateya: **"ku em fişarê li yê din bikin ji bo ku dest ji mafê xwe berde ji bo berjewendiya hemûyan"**(56). Ji ber ku beşdariya prosesa perwerdeyê di dadweriya veguhêz de teşeyek ji teşeyên destwerdanê ye, ku: **"doza dadweriya veguhêz ji aliyê mafnasiyê û bengîniyê ve, dozeke rast e, lê belê ji aliyê pratîk ve tevliheviyek e, lewre divê perwerde tam bêalî be li beramberî hemû mijarên siyasî, edyolojîk û olî, divê ji her paşxaneyekê vala be"**(57). Li beramberî wê agahî li ba hin kesan derbarê vê têgehê kêm bûn.

## 14- Rola destûra heyî di xurtkirina wekheviyê de, di navbera her du zayendan û saziya perwerdeyê de:

hin beşdarvanan dest nîşan kirin ku derfeta sûdwergirtina ji destûrên sûrî yên kevn berî hikmê Be's, **"Destûra Sûriyê baş bû, lê destwerdana partiya tenê bi rêya awarteyan, û derbaskirina rêkeftinên teorî di destûr de, mixabin hişt ku ji naveroka xwe vala bibe, lê destûra sala pêncî û destpêka şêstî ya herî baş bû"**(58). Ji ber ku destûra niha ne hestiyar e ji bo wekheviya di navbera her du zayendan de ji aliyê naverok û ziman ve, tê de kêmnetew û cihêrengî nehatiye bi bîrxistin **"Gava danasîn bi cihêrengiya neteweyî, olî û zimanî hebe... ew ê bi awayekî xwezayî bandora xwe li dibistanan bike"**(59), digel wê, destûra niha ji bo avakirina minhacên perwerdeyê yên sergihayî ji bo hemû çînên civaka sûriyê, ji ber ku xwe

(53) Elîs Mufrec, Hesabxwestina ji hemûyan û Dedweriya Veguhêz, Navenda Sûrî ya Ragihandin û Azadiya Derbirînê, Saziya Friedrich Ebert, Bêrût, Libnan, 27 gulanê 2022.
(54) Nuha Ebû El-Deheb, Afirînerî di Dadweriya Veguhêz de: tecrubeyine ji herêma erebî, 24 mijdarê 2020, https://www.brookings.edu/
(55) Selam Mihemed, Dadweriya Veguhêz, Têgeh, Armanc û Alavên Pêkanînê di dadweriyê, 6 nîsanê 2021, ‹ https://pro-justice.org/
(56) CI – Agahiyên Şaş derbarê Dadweriya Veguhêz de, hişt ku gelek kes nêrînên netekûz ava bikin, ev yek jî li ser têgehên siyasî, ramyarî û rêxistinî derbasdar e, lewre diviyaba mamoste li ser van têgehan werin hînkirin.
(57) CS
(58) CE: Tevî ku destûrên berê bi valahiyan dagirtî bû, ku hişt em bigihêjin van pirsgirêkên îroj.
(59) CQ

dispêre şerîeta îslamê û fiqha îslamê,(60) li beramberî wê û li gorî hin beşdarvanan li Qamişlo û Reqqayê ku jinên niha di tecrubeya Rêveberiya Xweser de, mafên xwe ji mêran zêdetir standine, bi taybet di perwerdeyê de, berûvajî herêmên din ên Sûriyê! Tevî hebûna hin encamên din ên wekheviyê ku behsê nekirin, weke leşkerkirina zarokan, nepejirandina cudahiyê û ji bilî wan.

## 15- Saziya perwerdeyê û veguhestina siyasî:

nêrîneke zelal li ba beşdarvanan li hemû herêmên ku lêkolîn lê hatiye kirin, derbarê çarenûs û rola perwerdeyê di heyama prosesa veguhestina siyasî de, tune ye, tevî hebûna reşbîniyê bi giştî ji gengaziya qewimîna wê; hin kesan li Reqqayê xwestin ku dûrî edyolojiya girêdayî partiyên kurdî bikevin ji bo ku em bigihêjin asteke wekhev, tevî ku hin kesên din li Reqqa û Qamişloyê dîtin ku rewşa perwerdeyê li bakur rojhilatê Sûriyê ew heman e yê ku dê di heyama veguhestina siyasî de be "Cudahî tune ye, cudahî ew e ku zimanê erebî li ba me ê bibe zimanê kurdî... û dîrok ê derbarê Rojavabe".(61)

## 16- Beşdarbûna avakirina Sûriyê:

A. Geşkirina domdar: ew geşkirina ku pêwîstiyên niha peyda dikin bê ku ziyanê bigihîne şiyana nifşên pêşerojê ji bo dilsoziyê bi pêwîstiyên xwe yên taybet, ew jî tê xwestin ku esûlên xwezayî ji bo armancên geşkirin û geşpêdanê di pêşerojê de.(62)

B. Vejandina zû: di bersivdayîna mirovî de, nîşanî heyama veguhêz a di navbera bersivdayîna awarte ya kirîzekê (weke karîsetên xwezayî an şer), û qonaxa jinûveavakirinê û geşpêdana demdirêj de. Armanca sereke ya vejandina zû di vegerandina rêyên jiyankirina bingehîn e, peydakirina pêwîstiyên sereke, jinûveavakirina heykelên bingehîn ên jîndar, divê tekûzî li ser başkirina şiyana tehmûlkirinê û berxwedana li hembera karîsetên pêşerojê. Li ser asta Sûriyê, di peydakirina ciheke demkî û jinûveavakirina xaniyan, çaksazkirina binesaziya sereke, vegerandina xizmetên sereke weke perwerdeyê û piştgiriya têrbûna aborî û şiyanên xwecihî.(63)

C. Jinûveavakirin: jinûveavakirin, ango avakirina ji nû ve, demnavîn û demdirêj, û vegerandina domdar a binesaziyê, xizmet, niştecihbûn, avahî û rêyên jiyankirinê ku karibin li ber xwe bidin, ji bo ku karibin bi sergihayî karekî ji civaka xwecihî an civaka bi karîsetê bandor bûye

(60) CS – Ji ber ku roleke destûrê di sazkirina siyseta perwerdeya nava dewletê de heye, lewre diviyaba destûrê Sûriyê niha bi aliyê fiqih û şerîeta îslamê de bû, ev jî bû astengiyek li pêşberî sazkirina siyasete-ke perwerdehî, dikare mihancekî perwerdeyê hemû pêhateyên civaka Sûriyê bigire nava xwe.
(61) CQ – Di heyama axaftina xwe de derbarê rewşa perwerdehiyê li bakur rojhilatê Sûriyê (Rojava), dest nîşan kir ku erebî bû materyalek di minhacên perwerdeyê de, û herdu materyalên Dîrok û Erdnîgarî drbarê vê herêmê ne, ango ew ne cudayî perwerdeya ku dê bibe di qonaxa veguhêz de.
(62) ESKWA, geşpêdana domdar, 2022, https://www.unescwa.org/.
(63) Eymen El-Desoqî, Sendoqa Vejandina Zû: derfetine veşartî û xeteriyên heyî, Navenda Umran a Lêkolînên Stratejîk, 15 gulanê 2024, https://www.omrandirasat.org/.

re bikin, ew jî li gorî rêgezên geşpêdana domdar û "jinûveavakirineke baştir", ji bo dûrketina ji xeteriyên karîsetan li pêşerojê an kêmkirina ziyanan.[64]

Hemû civatên guftogoyê kom bûn li ser ku minhacên niha û prosesa perwerdeyê li Sûriyê, li hemû herêmên desthilatê, nikarin beşdarî geşpêdan, vejandina zû û jinûveavakirinê bibin heta berî bûyerên Sûriyê jî, ji ber kêmasiyan di qebûlkirina şagirtan de di qonaxa amadehî de, ger di amadehiya bazirganî, pîşesazî, karê jinan, şerî'e, pêgihandinan, wêjeyî an zanistî, heta di pisporiyên zanîngehê de jî. Ji ber ku armanca dawî ji perwerdeyê "çêkirina karmend" bû, ev mekanîzme piştgiriyê nade perwerdeya afirîner û afirîneran. Her wiha girîngî bo dibistanên pîşeyî naye dayîn tevî ku ew bi awayekî bingehîn beşdarî vejandina zû dibin, civak bi xwe jî bi giştî meyla xwe li ber ramana ku zarok di pêşerojê de bi postên xwedî payeyeke civakî û mûçeyeke baş rabin, weke bijîşk, parêzer û endazyar, bê ku girîngî ji bo meyla rastîn a zarok were dayîn, û di hişê zarokan de ev raman tên çandin ji ber sedema dahatûya bilind di van delametan de **"Ger dahatûya pîşesaz mîna dahatûya bijîşk ba, hemû kes ê berê xwe bidin pîşesaziyê"**[65]. Perwerdeya niha taybetiya hawîrdor û pêwîstiyan berçav nagire, herêma bakur rojhilatê Sûriyê hewcedarî beşên endazyariya çandinî, endazyariya av û avdanê, endazyariya veguhestinê, Veterînerî û petrolê. Divê geşpêdan derfetên şagirtan li herêmê berçav bigire. Her wiha zarok bi pêşeroja hînkirinê qanih nabin ji ber ku dibînin mamoste di rewşên madî herî nebaş de dijîn.
Digel wê yekê, hêzên desthilat di nava nebûna qanûnê de rê didin xwe ku destwerdanê di dibistanê û têkiliya mamoste de bi şagirt re bikin, ev yek jî vebeyînên xwe di prosesa perwerdeyê[66] de di demên pêş de. Hema bêje nebûnek di binesaziyê de heye, û kêmbûna hejmara mamosteyan û kêmbûn di pisporiyên xwe de, lawaziya mûçeyan û hemdanên xwe di kar de[67]. Minhacên niha ji ber dijwariyê û dûrketina ji zemînê, beşdarî çesipandina rewşa herifî ya niha dibe, ew şagitan ber bi dûrketinê ve dibe, mizgîniyê nade ku li ser wê bingehê piştî derçûnê kar were kirin.[68]
Hin kesan dest nîşan kirin ku berî dest bi geşpêdanê, vejandina zû û jinûveavakirinê bibe, sê daxwaz hene, ew jî: çareseriya siyasî – ewlehî – binesazî; û bê wan em qonaxan dişewitînin[69], ji ber ku Sûriyê parçe ye, û çareseriya siyasî di serî de tê, ew jî proseseke demkî ye: "Ji bilî geşpêdanê, ez bawer dikim ku têgehên mayî ew têgehên demkî ne girêdayî rewşa siyasî ne"[70].

(64) UNSRR, jinûveavakirin, nivîsgeha Netewên Yekbûyî ji bo rêgirtina li pêş xeteriyên karîsetan, 2015, https://www.undrr.org/
(65) CI
(66) CE
(67) CR
(68) CD
(69) CQ
(70) CS

## Heftemîn – Pêşniyarên civatan "çi divê bibe":

### a- Cudakirina siysetê ji perwerdeyê û misogerkirina wekhevî û pirrengiyê:

1. Ji bo çaksazkirina sîstema perwerdeyê li Sûriyê, divê siyaset ji perwerdeyê were cudakirin bi rêya danîna armancên perwerdehî li gor heman dûrahiyekê bê cudahî ji hemû çînên civakê.
2. Divê destûr misogeriyê bide mekanîzmeyên perwerdeyê û xweseriya saziyên wê bi rêya madeyên di ser destûr re; û rahiştina hemû cureyên cudahiyê li dijî jinan û misogerkirina mafên wan di perwerdeyê de ji aliyê naverok û xîtabê ve.
3. Divê wezareta perwerdeyê girîngiyeke mezin bide mijara mûçeyên mamosteyan.
4. Ramanên girêdayî welatîbûna wekhev û pirrengî û cihêrengiya sûrî, dadwerî û peydabûna derfetan di navbera herdu zayendan de, divê ji pêwîstiyên civakê derkevin ji bo ku werin qebûlkirin û çesipandin, lewre divê kampaniyên hokirina civakî ji van rêgezan re werin kirin ji bo ku xwedî nirxeke bingehîn bin heta ku weke pêdivî were hîskirin.
5. Divê sûd ji tecrubeyên mîna hev ku gelên din tê re derbas bûne, were girtin, bi taybet Başûrê Efrîqiya û Rewanda.
6. Minhac dibe ku bi zimanê erebî bimîne digel hin wane ji bo xwendina zimanên çînên din ên ne ereb, dibe peymangehên teybet werin avakirin tê de minhac bi zimanên cuda be ji xezîneya dewletê werin avakirin.
7. Divê dansîn bi zimanê erebî weke zimanê fermî digel kurdî di perwerdeyê de were kirin, û danasîn bi cihêrengiya çandî û etnîkî sûrî di destûr de were kirin.
8. Rahiştina nimûnekirina rolên herdu zayendan ji perwerdeyê, weke ku xwedina pîşesazî tenê xort bin, û hunerên jinan tenê keç bin.
9. Waneyên exlaqê werin destnîşankirin ku derbarî efûkirin û vekirina li ser kesên din, hevgirtina civakî, dijîtiya tundrewê be, ji bo pêşxistina civakê û samana mirovî, û cudahî di navbera şagirt û mamosteyan neyê kirin.

### b- Mercên danîna minhacên perwerdeyê:

1. Yekkirina minhacan li hemû herêmên destserkirî di minhacekî tenê sergihayî de ji bo hemû çînên gelê Sûriyê, ku li ba hemûyan were qebûlkirin.
2. Ji bo pêşxistina minhacê, divê komîteya erkdar xwedî van taybetiyan be: bêalîtî – rasteqînî – xweseriya siyasî – destpakî – pisporî – şarazaya dirêj – dûrketin ji berjewendiyên kesane – herdu zayendan temsîl bike – hemû çînên civaka Sûriyê temsîl bike.
3. Pêşniyarên ku divê komîte berçav bigire: aliyê derûnî, civakî û çandî berçav were girtin bi

rêya pisporan di van waran de – aliyê guncav ji bo pêşketina şagirtan ji aliyê naskirin, zanîn û çandî ve were berçavgirtin – beşdarîkirina xwedî şarazayan – beşdarîkirina komek ji xwedî û şagirtan – pêkanîna nimûneyekê li ser beşek ji şagirtan – beşdarîkirina hin pêşengên civaka xwecihî – sûdwergirtin ji tecrubeyên dewletan – temsîlkirina hemû hêmanên civakî û çînên çandî û etnîkî – dûrxistina siyasetê ji perwerdeyê – divê ev komîte xwedî xweseriyeke tam bin, û nabe tu kes destwerdanê bike – divê li gorî armancên dewletê û berjewendiyên wê û berjewendiyên gel be, û pêdiviyên bazara kar, rewşa aborî û cudahiyên hawîrdorî werin berçavgirtin.

### c-Rola perwerdeyê di geşpêdana samana civakî de:

1. Şopandina meylên şagirtan ji refên destpêkê û geşkirina wan rolan, nabe werin kontrolkirin, lê divê ber bi beşê guncav ve werin arastekirin bi rêya karta şagirt a dibistanê bi rêya rênîşandêran.
2. Berçavgirtina taybetiyên her herêmekê ji bo danîna bernameyekî taybet bi wan ji bo geşpêdanê, vejandina zû û jinûveavakirinê.
3. Amadekirina binesaziyê û firehkirina wê, bi taybet li herêmên dûr, û piştgirîkirina mamoste ji aliyê madî, civakî û derûnî ve.
4. Dadwerî di mijara mûçeyan de di navbera delametan de, heta ku dahatû nebin hêmanek di arastekirna meylên şagitan de.
5. Girêdana derencamên perwerdeyê bi pêwîstiyên bazara kar ji aliyê piranî û çawaniyê ve.

### d- Jinûveamadekirina sektora perwerdeyê:

1. 1. Vekirina peymangehên amadekirina mamosteyan û zêdekirina hejmara mamosteyan, û rahênakirina wan li ser rêbazên dersdayînê yên nûjen.
2. 2. Erkdarkirna mamosteyekî alîkar di refên mezin de, ji bo alîkarîkirinê di çalakkirina rêbazên perwerdeya cihêreng de.
3. 3. Bilindkirina posta mamosteyan li ser bingeha şaraza, destkeftî û pêşketina pîşeyî, ne li gorî salên perwerdekirinê.
4. 4. Mafdayîna mamosteyên zilm dîtine ji aliyê hiqûqî, madî û moralî ve.
5. 5.Avakirina komîteyekê ji bo danûstandina domdar digel pisporan li derdora cîhanê, xwendina lêkolînên perwerdehî, rahênanên nûjen û pêşkêşkirina wê ji mamosteyan re bi awayekî dorveger.

### e Amadekirina pîşeya rênîşana derûnî – civakî li dibistanê:

1. Piştigirîkirina rênîşandêrên derûnî û civakî bi amadekirina pîşeyî di heyama zanîngehê de, bi dewreyên guncav bi awayekî dewrî piştî wê.
2. Peydakirina alavên karê rênîşandêran li dibistanê, xurtkirina cihên wan, rolên wan û hêsankirina pêwîstiyên karên wan.
3. Divê em kar bikin weke tîmekî rênîşanker di koreya perwerdehî de, digel peydakirina bijîşkekî derûnî di her koreyekê de, û çalakkirina şandina nexweşan bo dermankirinê.
4. Kêmkirina karên kexezî li dibistanan, û berê xwe bidin aliyê pratîk.

### f- Çareserkirina pirsgirêka derengmayînê û dûrxistina ji dibistanê:

1. Divê zagona mecbûriya perwerdeyê were çalakkirin, û bernameyên "perwerdeya gelêrî" were pêkanîn bi hevkariya civaka xwecihî, bi rêya bikaranîna TV, tevnên tora civakî û ji bilî wan, weke nimûneyên perwerdeya lezkirinê, perwerdeya qerebûkirinê, perwerdeya dermankirinê an minhaca UNICEF ê şagirtên dûrketî ji bo çareserkirina diyardeya dûrketinê.
2. Pêkanîna dewama beşî ya şagirtên dûrketî li dibistanê an peymangehên taybet ji bo fêrkirina tiştên bingehîn weke xwendin, nivîsandin û bîrkarî.
3. Piştgiriya malbatên şagirtên dûrketî ji aliyê madî ve û peydakirina pêdewistiyên perwerdeyê ji şagirtan re, ger zarok şertê amadebûnê ji bo heyamekê pêk anî.
4. Rêxistinkirina kampanî, serdanên malan û cihên karê zarokên dûrketî ji bo hokirina şagirtên dûrketî ku vegerin perwerdeyê û hemdanan pêşkêşî wea bikin.
5. Peydakirina kadroyên perwerdekirinê yên li ser danûstandina bi şagirtên dûrketî re hatine amadekirin.
6. Qedexekirina zewaca zû, karkirina zarokan, karanîna hişberan û hokirina xwediyan bi wê yekê.
7. Çareserkirina rewşa şagirtên amade nabin û yên ji perwerdeyê dûrketine.

### g- Rola rêxistinan di piştgirîkirina sektora perwerdeyê:

1. Dîtina kargêriyek an mecliseke perwerdeyê ku berpirsê hevrêziyê bi rêxistinan re be ji bo misogerkirina berdewamiyê, peydakirina pêwîstiyên perwerdeyê û pabendî bi siyaseta wê, misogeriya hevkariya madî, pevguhertina şarazayan, û hevkariya zanistî û pratîk digel rêxistinan.
2. Divê rêxistinên navnetewî yên destnîşankirî nêrînekê ji qonaxa veguhêz re dest nîşan bikin ku tê de minhac demkî û ji hemûyan re guncav û bêalî be.
3. Divê rêxistinên navneteweyî fişarê li ser rêjîma Sûriyê bikin, ji bo ku danasînê bi bawernameyê

ji kargêriyên perwerdeyê li Idlib û bakur û rojhilatê Sûriyê, bike ger li gor mercan be.

4. Rêxistinên navneteweyî dikarin alîkariyên madî û teknîkî pêşkêşî minhacan û çawaniya madeya zanistî bikin û pêşketina perwerdeyê bişopînin.
5. Divê rêxistin dewreyên hişyariya siyasî ya mamosteyan pêşkêş bike ji bo ku histiyariya rola xwe di prosesa avakirina dewletê de nas bikin.
6. Divê rêxistinên daner taybetkariya rêxistinên xwecihî yên ku wan fînanse dikin ji bo bername û projeyên perwerdeyê, berçav bigirin, bi rêya lêkolînkirina dosya û ruxsetên rêxistinên xwecihî ku werin tekezkirin ger ew di vê warî de pispor in.

## h- Pêkanîna lêkolînên pêşerojê:

1. Vê lêkolînê hejmarek ji nakokiyên cewherî di navbera çînên sûrî de da diyarkirin, ev dibe ku bandorê li ser yekîtiya dewletê û avaniya wê ya civakî bike, vê yekê pêwîstiya pêkanîna gelek lêkolînên ku xwe dispêrin diyaloga avaker derxist holê, ji bo ku em bigihêjin pêşniyarên ku dikare bersiva van mijaran bide.

## Heştemîn – Dawî:

Xuya bû di heyama civatên ku hatin pêkanîn, kûrahiya cudahiya di helwestan de li beramberî mijarên perwerdeyê ku hatin gengeşekirin, ne cudahiya di helwestan de di navbera civatekê û ya din de ye, lê belê cudahî di helwestên navbera amadekarên di heman civatê de bû, ango di helwestên nimûneyan ji niştecihên heman herêmê bû; ev yek jî nîşanî pêwîstiya lezkirina prosesa diyaloga sûrî-sûrî dike, û danîna xalên nakok ên girêdayî prosesa perwerdeyê li ser maseya diyalogê, ji ber ku rewşa niha ê cudahiya heyî biçepisîne, û bi demê re veguhêze rêbendên dawî ku bihêle dewletên biçûk li Sûriyê derkevin, û çareseriya siyasî her tim ew dergeh e ji bo çareseriyên mayî; lê belê perwerdeya bi vejandina zû re li gor rewşa heyî di nava nebûna çareseriyê de, ew bijardeya ku xwe bihêz pêşkêş dike.

Tevî wê, tiştê hevbeş di navbera hemû herêman de gelekî mezin bû, bi taybet di êşa hevbeş a mamosteyan de li beramberî perwerdekirina nifşan û avakirina welatekî di nava herifîna rewşên aborî, perwerdehî û lojistîk de, û daxwaza wan ji bo jinûveavakirina tiştên hilweşîne û derbaskirina tiştên derbas bûne. Ew li ser pêwîstiya avakirina dewleteke nûjen li gor hêmanên şaristaniyê li hev dikin, û pêwîstiya bêalîtiya perwerdeyê û qedexekirina siyasetkirina wê, divê perwerde sergihayî be ji bo hemûyan, heman dûrahiyê ji hemûyan ve be, û perwerde yek ji girîngtirîn şaxên samana civakî û mirovî ye, misogeriya geşpêdana domdar piştî wê ye, ew jî xwedî rolekê di heyama dadweriya veguhêz de ye, divê bêalîtiya wê were misogerkirin, û dûrî her cudahiyekê li ser bingeha zayend, ol, çîn, nijad an ziman be, ev yek jî divê di destûr de were misogerkirin, divê rêxistinên navneteweyî fişarê bikin ji bo danasîn bi bawernameyên sûrî were kirin, û hêzkirina mamosteya bi rêya perwerdekirina wan li ser rêbazên perwerdeyê yên nûjen, û piştgirîkirina binesaziyê û çareserkirina doza dûrketinê.

Her wiha beşdaran tekezî li ser tecrubeyên gel û dewletên din kirin, ên ku sûd ji perwerdeyê girtin di prosesa jinûveavakirina dewletê û avaniya civakî ya gel de, digel wê pêwîstiya jinûveavakirina minhacên nû yên sergihayî û heman dûrahiyê ji hemûyan ve, ne siyasetkirî be, dibe ku bi zimanên din be ji bo ku çînên zimanî yên cihêreng li Sûriyê werin berçavgirtin.

Xalên lihevkirinê û nakok, xaline stratejîk in; di demên pêş de, ew xalên nakok ger nehatin çareserkirin, ê bandoreke kûr bide nakokiyên di navbera çînên gelê Sûriyê de, ji ber ku ew ê nifşine derxîne ku nikaribin tevlî bibin û bi çînên din ên civakê re di nava dewletê de bijî. Berûvajî wê, ger xalên lihevkirinê hatin destgirtin û xalên nakok hatin çareserkirin, ev yek ê bihêle çînên civakê nêzî hev bibin, û ji nû ve bibin yek, lewre diviyaba liv û tevger bihatiba kirin ji bo çareserkirina van xalan li rex pêşniyarên ku ji civatên guftogoya berê derketine.